## Peymangeha Navnetewî ya Şano ITI
**Rêxistina Cîhanî ya Hunerên Şano**

**Peter SELLARS, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA)**
Derhênerê Opêra, Şano û Festîvalan

Peter SELLARS li Pitisbêrgê, Pênsilvêniya, (DYA) ji dayik bûye, û ew derhênerê opêra, şano û festîvalan e. Wî navdariyek navnetewî bidest xistiye li ser ravekirina veguherîner û pêşeng ya klasîkan, piştgîriya sedsala 20-an û muzîka hemdem, û projeyên hevkarî bi rêzeke mezin a hunermendên afirîner û pêşkêşker re.  Xebata wî hêza hunerê wekî amûra derbirîna exlaqî û çalakiya civakî dide xuya kirin.

Wî opêra li dar xistiye li Opêraya Neteweyî ya Hollandayê, Operaya Neteweyî ya Îngîlîzî, Festival d'Aix-en-Provence, Lyric Opera ya Chicago, Opéra National de Paris û Festîvala Salzburgê û gelekên din.

Sellars di afirandina gelek berheman de bi awazçêker John Adams re hevkarî kiriye, di nav de *Nixon li Çînê*, *Mirina Klinghoffer, El Niño, Doctor Atomic, Incîl Li gorî Meryema Din,* û *Keçên Rojavaya Zêrîn*. Bi ilhama kompozîsyonên muzîkê Kaija Saariaho, wî berhemên karê wê tewcîh kiriye (*L'Amour de loin*, *Adriana Mater*, *Tenê deng dimînin*) Ku repertuvara operaya nûjen berfireh kirine.

Di nav Projeyên wî yên vê dawiyê evin: (Berî pandemiyê) Berhema ya *nû Doctor Atomic* li Operaya Santa Fe, şanoiya ya Claude Vivier *Kopernikus* ji bo Festîvala D'Automne (Parîs), û behema Mozart *Idomeneo* ji bo Festîvala Salzburgê.

Di dawiya sala 2020-an de wî hizirikirin û derhêneriya "*ev laş ew qas bêdawî ye* ..." kir, ku fîlimekî di bersiva pandemiya cîhanî de çêkir ya ku ji nivîsa Vimalakirti Sutra hate îlhama kirin.

Projeyên pêşerojê dê evbin: şanogeriya Roman du Fauvel bi hevkariya muzîkologîst û damezrînerê Sequentia Ensemble, Benjamin Bagby; vejîna berhema navdar ya Sellars *Tristan und Isolde* , ku çîroka wê hate ronîkirin û kûrkirin bi vîdiyogirafîkek bilind ku hate afirandin ji hêla wênesaz Bill Viola; û herwiha *Perle Noire*, medîtasyonên ji bo Josephine, bi muzîka

awazçêker û pir-alavkar Tyshawn Sorey ji hêla dengbêja bêhempa Julia Bullock ve hate pêşkêşkirin.

Sellars rêberiya gelek festîvalên hunerî yên bingehîn kiriye, di nav de Festîvalên salên 1990 û 1993 li Los Angeles û Festîvala Hunerî ya Adelaide di sala 2002-an de. Di 2006-an de ew bû Rêveberê Hunerî yê New Crown Hope, festîvalek li Viyanayê ku hunermendên nûhatî û damezrandî yên ji paşxaneyên çandî yên cihêreng vexwendibûn da ku di warên muzîk, şano, dîlan, fîlim, hunerên dîtbarî û avasazî de karên nû biafirînin bi boneya salvegera 250 an  jidayikbûna Mozart. Wî wekî Gerînendeyê Muzîkê yê Festîvala Muzîkê ya Ojai ya 2016-an xizmet kir. Sellars Profesorê bijarte ye di Beşa Huner û Çandên Cîhanî de li UCLA, rêvebirê damezrîner ê Enstîtuya Boethius li UCLA, kordînatorê niştecîh ê Festîvala Fîlman a Telluride ye, û şêwirmendê Destpêşxeriya Hunerên Rolex bû. Ew wergirê hevaltiya (zemalet) MacArthur e, Xelata Erasmus ji bo beşdarbûna çanda Ewropî, Xelata Gish, û endamê Akademiya Huner û Zanistên Amerîkî ye. Wî xelata giranbuha ya Polar Music Prize wergirtiye û ji hêla Musical America ve wekî Hunermendê Salê hatibû destnîşankirin.

Werger ji zimanê Ingilîzî: Salar Muhemed

Koman Şano - Sirya/Qamişlo